Haringey
Mental Health Service

Xizmetên destekê

Gelek xizmetên bêpere hene ku wê destek, şîret û alîkariya pratîk bidin we ku hun bikarin di nav mala xwe de bimînin. Her wiha, ew dikarin di van waran de jî alîkarî bidin we: şîreta malî, girtina alîkariyên peran, ditîna/çêkirina hevalan, dîtina aktîvîteyên derbaskirina demek xweş, danîna têkiliyan bi mirovên heremê re, dîtina Tixtoreke malbatê, meselên xaniyan, pirsên koçberiyê, hîndekarî û xebat, xwendegeh û lênêrîna zarokan û xizmetên heremî yên din.

Her çiqas, ev xizmetên hanê wê şexsan temsîl bikin û li ser navê wan bipeyivin, armanca wan ew e ku ew xwe-baweriyê ava bikin û di dawiya dawîn de îmkan bidin mirovê ku ew bê destek jiyana xwe bikare îdare bike. Ev xizmet diçe mirovan di nav mala wan de ziyaret dike û her wiha, destekê dide kal û pîr ên ku li ber derketina ji nexweşxanê ne, ji bo wan tiştine pratîk hal dikin ku kal û pîr bê pirsgirêk ji nexweşxanê derbasî nava mala xwe bibin.

Heke ku ihtiyaca we bi xizmetên tercûmaniyê hebe an hun agahiyan bi zimanekî din dixwazin, em ê bi kêfxweşî, vê yekê ji we re eyar bikin.

Destaka malî ya vê xizmetê ji Supporting People tê girtin û xizmet ji aliyê organîzasyonên sektora dilxwaz ve bi rê ve tê birin.

Hun xwe çawa dikarin bighînin xizmetên destekê
Hun dikarin sererast bi telefonê an bi nameyê bi wan re bikevin têkiliyê, an jî, profesyoneleke lênêrîna sosyalê an sihetê dikare li ser navê we, hewalekî bike. Ew ê ji we bixwazin ku hun ji wan re nav, edres, tarîxa jidayîkbûnê, sedema daxwazê û ihtiyacên xwe yên tercûmaniyê bibêjin.

Xizmet li vir in
Ji bo mêr û jinên 60 salî û jortir:
60+ in Haringey
Block 27F, Units 3/4/5/6
N17 Studios
784-788 High Road
Tottenham N17 0DA
Tel: 0800 652 610
Em her roj di navbera seet 9.00 - 21.00 an de vekirî ne.

... didome/ ...

HARINGEY COUNCIL NHS

Ji bo mezinên 16-65 salî, mirovên tenê bi serê xwe û mirovên cot:
Key Support
7 Willoughby Road
London N8 0HR

Tel: 020 8347 2327
Faks: 020 8348 0418
Email: keysupport@communityhousing.org.uk

Mirovên xwedî seqetiyan dikarin bikevin hundirê avahiyê û em ji Duşemê heta Înîyê di navbera seet 9.00-17.00 an de vekirî ne.

Ji bo malbatên bi zarok:
HARTS (Haringey Tenancy Support) for Families
1-7 Corsica Street
London N5 1JG

Tel: 0845 303 2350
Faks: 020 8826 1701
Email: harts@circle33.org

Mirovên xwedî seqetiyan dikarin bikevin hundirê avahiyê û em ji Duşemê heta Înîyê di navbera seet 9.00-17.00 an de vekirî ne.